

Agahî li ser Dixtoriya Bi Derzî ya Guh û belgeya razîbûnê

Li vê navendê em dermankirina guh ji riya Dixtoriya bi Derziyê li gorî Protokola *NADA raber dikin.

Ev derman ji billî babetên din, jibo kesinan bi kar tê ku di nava qeyranê da ne an dem û gavin dijwar derbas kirine. Dixtoriya Bi Derzî ya guh bo hemî kesan dikare pêk bê. Babetên pizîşkî yên qedexeya bikar anînê nehatine naskirin

Dixtoriya Bi Derzî aramker e (Wek mînak bo kêşeyên fikrî û bêhedariyê), hişyarî û Lêhûrbûnê xurt dike (Wek mînak bona westiyên û lawaziya berdewam) û xewê baştir dike (Wek mînak li nakokiyên razanê).

Dixtoriya Bi Derzî ya NADA te bihêztir dike, bi awayekî ku bikarî baştir li hember îstrês, dilgiranî û bêhedariyê bi ser bikevî.

Ev cûreya dermankirinê pirranî bi awayê komkî pêk tê. Tu rûdinî û guhên xwe bi alavê paqijkerê guh paqij dikî. Pêk anîna vî karî hinekî şewatê li guh pêk tîne. **3-5 derziyên nazik** heta kûrahiya 2 mm **di nav her du guhên te da** dikevin nav çerm. Têrekirina derziyan rege êşeka kêma ya kurtedem pêk bîne. Baştir ev e ku dema têrekirina derziyan bêhna xwe vedî. Dermanker te hanî vî karî dide.

Heke pêkan be derzî bi qasî 45-30 deyyeyan li cihê xwe dimînin: Ji kerema xwe di vê heyamê da xwe ji xwarin, vexwarin, xwendin an meşiyane dûr bike. Carna derzî xwe bi xwe tîn derê. Dilgiran nebe.

Di dawiya heyama dermanê derziyan bikişîne derê û wan bavêje nav şûna diyarkirî. Piştra bi paqijkerekî guh ê Sillûlosî derbekî aram li cihê derziyan bide. Rege kêliyekê xwîn bê derê. Ev jî tiştêkî xwezayî ye.

Dewsa derziyan, meriv dikare **nuxteyên guh** bi **Morikên Megnitîk ên bi Rûveka Zêrê jî** derman bike. Ev "Mirwarî" bi zeliqokên biçûk li çerm dizeliqin û rege heta heftiyekê girêdayî bi çerm bimînin. Piştî wê yekê divê wan biguherînin.

Dixtoriya Bi Derzî ya NADA rihet e û kêmtir caran dûhatên wê hene. Li babetên gellek kêmdîtî, ev dermana rege bibe sedema werimîn û perçiftîna nuxteya ku derzî hatiye têrekirin. Di vê rewşê da divê serî li dixtor bidî. Her wiha kêmtir caran rege bibe sedema bertekeka dil an serêşê. Heke ev babet û dûhat hebûn, derzî ji leşê te tîn derxistin. Ev kar her wiha rege bertekên hestbarî û hisî pêk bîne ku rege wek cûreka Arambûn û Hesta Tenahiyê were hesabandin.

Min ev agahî û zanyarî bi tamî fam kirine û pêk anîna Dixtoriya bi Derzî dipejirînim.

Dem

Paşnav

Wajo

***NADA kurtbûyîyê "Civata Neteweyî ya Jêbirina Jehrê bi Dixtoriya bi Derzî" ye.**